# NEWROZ



Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988



Osman Sebrî
1905 - 1993

<u>Xebat ji bo :</u> *** Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.**
*** Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.**
*** Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .**

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ*
*Email :* Newroz95@hotmail.com

| Hejmar(72) | Sibat | 2007 z-2618 k | Buha (15 ) p.s |
|---|---|---|---|


# Hevalê Şêx Alî azad e

**Li** 16.2.2007 an êvarî , destlatên ewlekariyê hevalê Şêx Alî sekretêrê partiya me ,partiya Yekîtî Ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê , li paytextê berdidin . Li roja 18.2.2007 an , li ser riya Şam dergehê bajarê Helebê , hin hevalan û bi beşdariya serokê partiya me mamoste Isma’îl Umer û li gel kesin navdar ji ragiyandina Şam , bi coşeke gerim pêşwaziya xebatkarê me yê hêja kirin . Piştre , li ser riya Efrînê , ew tev karwaneke mezin ku, bi ala Sûriyê , simbola partiyê û wêneyên birêz Ş. Alî xemilandî, ji heval , dost û hogirên wî bûn .



Karwana otombîlan bi rêket. Li kat yek , li Kefircenê , goristana Zarata Henên ( Gora Nemir Nûrî Dêrsimî) , gelê me yê Kurd , heval û dost , gelek komên folklorî bi cilên rengîn , gul û çîçekan , dahol û zurne , çepik , lîliya jinan û sirûda Ey Reqîb , pêşwaziya xebatkarê xwe û wê karwanê kirin . Herweha di pêşiya sera Efrînê re , paşê çarşiya ku diçe Raco ta ku , giha lîstgeha werzîşê ya bajarê Efrînê. Li wir bi beşdariya bêtirî 6000 heval dost û bi hildan û libakirina , ala Sûriyê , simbola partiya Yekîtî ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê , wêneya hevalê Şêx Alî , vestîval destpêbû . Destpêkê Avokat Selah Kênco li ser girîngiya hevpişkiya gelê Kurd di rêvebirina Sûriyê de , biratiya gelên Sûriyê ji hev re, azadî , wekhevî û aştiyê , yekîtiya niştimanî û berdewamiya guftogo di navbera tevgera Kurd û hêzên niştimanî li Sûriyê rawestî. **D.R.(10)**

www.avakurdi.org

# Nûçe û Kurte nûçe

## Dadgeha Ewlekariya bilind li Şamê 12 Kurand ceza dike

Di 4-2-2007 an de, dadgeha ewlekariyê ya bilind li Şamê, 12 girtiyên Kurd, di meşa mûman ya li helebê, di êvara Newroza 2006 an de, dadgekir.

Dadgeha ewlekariyê, hemî girtiyên Kurd bi sedema derbasbûna nav Komeleyeke veşartî û armanca wê , qetandina parekre ji axa Sûriyê , li gorî xala 267 ya ji zagona cezayê tewanbar dike .

Cezayê 12 girtiyên wê êvarê weha hate birîn:

Ciwan Bekir, Ehmed Elî Rustem, Mihemed Elî mistefa, Mihemed Hesen û Luqman Mistefa 7 sal û nîv

Ebdil-Qadir Şêxo, Enayet Elî Îbiş 4 sal .

Şêrzak Bekir û Mihemed Mihemed Îbiş 3 sal .

Hersê zarok, Mistefa Hesen, Şêxmûs Qasim, Xebat Reşkêlo 2 sal û nîv.

Bêguman, ew ceza gelekî pir û pir e. Ew girtî, ne diz, xwînmij, mêrkuj … in, guneha wan ev e: Şahiya wna bi boneya hatina cejna Newrozê, cejina netewî ya Kurd e.

Bi navê rêdeksiyona belavoka NEWROZ û hemî xendavaên wê, serbestkirina hemî girtiyên siyasî û nêrînê, di girtîgehên Sûriyê de dikin û doza rakirina zagonên awerte taybet, serjimara awerte ya bi taybetmendiya Kurdên Hesekê, dadgeha ewlekariya bilind …… û H.W.D dikin .

## Kuştina Hrant dink nîşaneke li dijî demoqrasiyê ye

Di 19-1-2007 an de, li bajarê Stenbulê, rojnemevanê Ermen yê bi nav û deng , berpirsiyarê rojnama ARGOS, ya bi zimanê Ermenî, Hrant Dink, bi destê nijadperestekê Tirk tê kuştin. Hrant, li Tirkiyê û derve, xwedî nêrînên lîbral , demoqrat û renegrî li rijîma Tirk tête nasîn.




Rijîma Tirk, weke hemî rijîmên mafxar û nijadperest, nikare hebûna gelên di tirkiyê de , li ser axa xwe dijîn. Mina gelê KURD û ERMEN bipejrîne. Lewre, bi xinizî, ronakbîrên wan gelan dikuje û ji holê radike.

*************************

## Bavê Mesûd jî çav damrandin

Roja 15-2-2007 an, dilê heval Elî kurê Hebeş. Ji gundê Çençeliya. Herêma Kurdaxê rawestî. Bi beşdariya gelek heval, kesên derdora wî û malbatê, di goristana gund de binax bû.Li ser gorna wû, gotina rêxistina Partiya Demoqrat a Kurd li Sûriyê( YEKÎTî ) ya Heleb pêşkêş bû **.**

Heval Elî, di sala 1979 an de, derbasî nav refê tevgera Kurd dibe. Û ta roja çvdamrandinê , di kar û xebata xwe de berdewa bû.

Bi navê rêxistina Heleb, em serê xwe , hemî heval û malbata wî saxdikin.

*******************************

**Bi boneya hatina 8ê Avdarê, cejina jinên cîhanê, rêdrksiyona Newrozê, cejina hemî jinan û bi tybetî jina Kurd pîroz dike.**


**Bi boyeya salvegera bûyrên 12ê Avdarê, em esrê hemî malbatên şehîdan saxdikin û bila cihê wan bihuşt be.**

**Bi boneya cejina netewî , cejina NEWROZê, cejina aştî û azadiyê, hêviya me ew e ku, gelê me yê Kurd li sernserî cîhanê, Newroza xwe bi şîwekî aştê û şahî bidomînin. Û agirê Newrozê her û her bilind bibe**

www.arsivakurdi.org

# Li Cindirêsê rojeke xemgîn

**Ew** roja xemgîn , 20,2,2007an , roja jinavmebarkirina, lawê Kurd , lawê Cindrêsa delal (Efrîn ), kemal Mihemed kurê Elî ( Kemalê Şetê ) bavê Elî bû . Ew roja xatirxastin û silava dawiyê li wî xebatkar û welatperwerê hêja û bi nav deng bû .



Bavê Elî li sala 1939an ji dayik bû , di 1974an de , derbasî nav refên partiya demoqrat a Kurd li Sûriyê ( Elpartî ) bû û ta sala 1984an bi coşke mezin xebitî . Li sala 1984an , ew ji aliyê hêzên ewlekariyê ve , hate girtin

Piştre û ta vê dawiyê ew endama Partiya Yekîtî ya Demoqrat a Kurd li Sûriyê , refê dudiyê bû , taku , bû endama encûmana hevbend a Kurd li Kurdaxê . Xebatkarê me xebata xw ta roja dawî berdewam kir.

Li 20.2.2007an xelkê Cindirêsê , meriv û xisimên wî , heval û dostên partiya Yekîtî , û bi beşdariya şandek ji Hevbenda Kurd li Sûriyê û hinek heval ji partiyên Tevgera Kurd li Sûriyê , cenaza bavê Elî ji mal bi derxistin û di çarşiya cindrêsê re , berve goristanê bi rêxistin . Ji mal ta goristana cindirêsê , koma niştîman a folklorî bi cilên xwe yên rengîn di pêşiya cenazê nemir de , bi dest wan de , di pêşî de baxek gul û çîçek bi navê H.K.S , dûvre du bax gul bi navê P.Y.D. K. S û di nav herdu baxan de , wêneya bavê Elî hildayî û li piş cenazê xebatkarê me ,ew cemawerê mezin , heval û dostên wî berve goristanê dimeşiyan .

Hêjaye bê gotin ku , ji mal ta goristanê , hemî firoşgehên li ser rê , ji bo rêzgirtina nemir deriyê xwe girtin .Ev bi xwe jî li ba xelkê Cindirêsê şana toreyeke civakî ne hindike hêvî ewe hemî herêmên dî yên Kurd wê sinciyê werbigirin . Piştî gîhana goristanê û veşartina terma bavê Elî, sê gotin li ser hatin xwendin . Yek bi navê Encûmana giştî ya Hevbenda Kurd li Sûriyê , ya dudiyê bi navê Encûmana Hevbena Kurd li Kurdaxê , û ya sisiyê kurê nemir Avokat Elî got . Hersê gotinan kar û xebata nemir ji haziran re diyarkirin û dan xuyan ku , gelê Kurd tucarê xebatkarê weha ji bîr nake.

Ji 20an ta 23an li bin konê sersaxiyê , kurê nemir mamoste Elî , merivên wî û heval û dostên P.Y.li Cindirêsê ji sibê ta dawiya êvarê , pêşewaziya ne kêmtirî 20000kes ji xelkê Cindirês û derdora wê , ji hemî deverên dî yên Efrînê û şandên sersaxkirinê ji Cezîrê de bigir , di Kobanî û Reqê re derbas be ta digihê bajarê Helebê dikirin .

Hemî şandên P.Y, ku dihatin bin konê sersaxkirinê , gotinek bi navê P.Y.D.Ks li ser giyana nemirê hêja digotin . Di hemî gotinan de li ser giringiya xebata mirov û Tevgera Kurd di ber miletê Kurd de , dihate rawestan .

Bi navê komîta rêvebir û xwendevanên rojnama Newrozê , bila serê xwedî , heval , hogirên bavê Elî saxbe û ciyê wî bihuşta bilind be .

www.arsivakurd.org

# ŞÊRGO CÎHANÎ Azad e!
# Pîrozname

16/02/2007

Hêja, kak **Şêrgo CÎHANÎ**
Rêz û silav…

Bi şanazî û dilxweşî, me mizgîniya serbestberdana we bihîst, ji ber vê yekê jî, em xwe bextiyar dibînin ku tu di nava gelê xwe de bi azadî dijî, bi hêviya ku rojek bi ser cîhana me de were, tu kes ji ber nerîn, bîrbawerî, nijad û ola xwe tariya zindanan nebîne.!! Em bawer in ku bi saya xebata têkoşer û mêrxasên zîrek di ber doza gelan, mafên mirov û mirovatiyê de, cîhana me nêzîkî wê rojê dibe.




Di bûyera reş a zindankirina we de, gelek sazî, nivîskar, kovar û rojnameyên kurdî û yên cîhanî piştgiriya we kirin, ev yeka han ne minet e, lê belê ew erk û stubarê me hemiyan e ku di riya kar û xebatê de em alîkar û piştgiriya hev bikin.

Li Sûriyê jî, kovar û weşanên bi zimanê kurdî têne çapkirin, ji nav wan jî weşana me ya du mehane(NEWROZ), bangek ji çapemenî û raya giştî re weşandin, têde, zindankirina we şermezar kirin.

Hêvî û omîda me ew e ku; Gelê Iranê bi hemû neteweyên xwe ve, bend û kelemçeyên rijîma komara Islamî ya kevneperest bişkîne, bi azadî, serfirazî û wekheviyê şa bibe, gelê kurd jî mafên xwe yên netewî bidestxîne.

Bi serbestberdana we em zor şa û bextiyar in!

Desteya weşana **NEWROZ**
Sûriya 16/02/2007

***Hêja kak Şêrgo…***

*Eger tu bixwazî û bi te ne zehmet be, tu ji xwendevanên NEWROZê re li ser kurtejiyana xwe, ya malbata xwe a xebatkar û sedemên girtina xwe binivîsî, wê pir baş û hêja be. Lê eger rewşa te ya ewlekarî rê nede vê yekê, dîsa em we pîroz dikin û zor sipas.*
*Digel ciwantirîn rêz û silav*

**Bersiva kak Şêrgo Cîhanî li ser Pîroznameya NEWROZ ê**

Berê her tiştek silaw û rêz û sipasîya xwe pêşkeşî xebatkarên kovara pîroz a NEWROZ dikim
Hevalên hêja
Her çi qas ez ne layqê ew qas mezin kirinê me û ez jî însanekim wek hemî kurdên bindestê cîhan, lê ji ber piştgîrî dayîna kesên wek we, em li hember dujminan mezin dibin û jîyana me jî gohartinên nû di xwe de çê dike. Ew jî nîşan dide ku ragehandinên kurd mezin in û dikarin hêzên xweyî nîşan bidin û dewletan lawaz bikin. Xebata we hemîyan pîroz dikim...
Bi rastî eger piştgîrî ya me kurdan li hevdû nebe, dewletan wê me bi rehetî,. bixon û bi her awayî reftar bikin Careka din gelek →

www.arsivakurdi.org

sipasîya xwe pêşkeşî we dikim.
Hevalno ez hêvîdarim di demek nêzî re babet û mijara ku ji min hatîye xwestin binwîsim û ji we re bişînim... lê bawerim eger hun pirsên xwe bişînin û ez bersiv bidim baştir dibe...
Bi hêvîya rojekî ku gelê me mafê jîyana azad bigre destê xwe û tu kes di girtîgehan de nemîn in.
Azadî mafê mirovan e!.
Serkeftin ji we re û ji xebatkarên kurd li her 4 alîyên welat!.
Birayê we yê biçûk ; şêrko Cîhanî – bajara Mehabad 16 . 2 . 2007

# H e v p e y v î n bi Ç a l a k v a n ê k u r d ŞÊRKO CÎHANÎ re

**_ Kak Şêrko tu gelekî bi xêr hatî…**

* gelek sipasiya we dıkim û silawê xwe ji NEWROZ û xwendwanên hêja re dişînim...

**_ Ji kerema xwe re, tu xwe bi xwendevanên NEWROZê bidî naskirin?.**

* Ez Şêrko CÎHANÎ xelkê bajara Mehabad, li sala 1977 hatime dinê û qasî 12 sale ku bi karê çîrokniwîsîn û helbest, herweha henek jî fîlman re mijul im. Ez endama sazîya rêxistina mafê Mirovan a rojhilatê Kurdistan RMMK û herweha di wan demên dawîyê de jî, ji ber xebatên endam3en hêja yên sazîya PEN, ez bun endama PENa kurd jî

**_ Em agedar in ku bavê te, di sala 1982 an de, li Tehranê, li ser destê rijîma komara Islamî ya Îranê ji bo kurdayetiyê hatiye şehîd kirin. Gelo ew bi çi tewanê hatibû gunehbar kirin?.**

* raste. Bavê min “ Elî CÎHANÎ “ tevî 2 hevalên xwe re bi tawana ku bombeyek li nimêja înê ya Tehranê bi xwestek û armanca kuştina hejmarek pasdar û mella yên wek “ Xameneyî “ din aw mafûreyek de bi cêh kir bûn, û piştî teqîna bombeyê û kuştina hejmarek pasdar hatibûn girtin. Girtina wan çend roj paşê pêk hat. Wê gavê ez zarok bûm. Îdam kirina bavê min bû sebeb kû ez zêde êş bibînim û bêbavî wek êşek ne tenê ji alîya maddî belkî di heman demê de menewî jî bû sebeba kêmasîyek mezin di jîyana min de. Min her zeman difikrîm ku pêwîste ez jî ji bo azadîya gelê xwe têkoşîn bikim. Mexabin hejmarek kesên kurd hebûn ku wê demê karê bawê min wek terror didîtin. Ez bi xwe li dijî kuştina însanan im. Lê gerek em wê yekê jî bidin berçawan kû wê demê de 1984-5 de dewleta îranê bi her awayî êrişê ser gelê me dikir û her roj bi bombeyan malan dişewtandin, kurdan dikuştin û tecawizê jinan dikirin. Gerek kurdan jî li Tehranê bersiv daban û şer li Kurdistanê berve welatê êrişkaran derbixînin. Ez karê wî ya kuştina pasdarên cenayetkar wek bersivek biçûk û li ser esasa parastina rewa dinirxînim.

**_ Tu di rêxistina mafên mirovên kurdistanê de endamî, kengî ev rêxistin ava bûye û armancên wê çi ne?.**

* rêxistina mafê mirovan a Rojhilatê Kurdistanê RMMK qasî 2 sale ku ava bûye. Ew yekemîn sazîya kurdan a medenî ye ku ji alîya hemî partiyên kurd →

.

www.arsivakurdi.org

wek PDKI, Komele , PJAK û partiyên din wek saziyek baş û cêhê bawerî hatiye nasandin û hemiyan ji nûçe u raporên wê saziyê îstîfade dikin. Ew sazî ji aliya dewletê bi fermî nehatîye qebul kirin û dewlet bi temamî jî êrişê ser wî nake, ji ber ku mesele ya mafê mirovan li Îranê hinek hestyar û hesas e û pirsgirêkên nawnetewiya Îranê di wê warê de heye. Sazîyekî mafê mirovan armanca wî li welatekî bindest wek Kurdistan de gerek berî her tiştek 2 armanc hebe; 1. nûçegehaniyekî rast û deqîq . 2. perwerdekirina gel di warê nas kirina mafên xwe yên huquqî.

Hun dizanin ku di Kurdistanê de gelek caran û belkî rojane û dem bi dem bûyerên nexweş û zulim ji aliya dewletan pêk tê. Gelek ciwan û jinên kurd tên girtin an şehîd kirin. Mînakî ciwanê kurd li mehabadê “ Şiwane seyd Qadir “bê ku tu gunehek kir be ji aliya hêzên dewletê hat qetil kirin. Me dît ku belav bûna wêneyên qetil kirina Şiwane li ROJ TV bû sebeb ku li hemî cîhanê de meseleyekî esasî ya bin pê kirina mafê mirovan li parçeyekî Kurdistan biteqe. Tenanet serhildanên mezin çê bûn. An jî gelek kes dikewin nawa zîndanan û gerek man girtina wan an jî zulmê ku li wan tê kirin , bikewe ber çawê cîhanê û gel jê agehdar bibin. Xweşewtandina jinan û herweha meseleyên wek hebûna mayîn ( elxam ) li ser sînoran û gelek babetên din hene ku saziyekî mafê mirovan dikare li ser wana bisekine. Saziya mafê mirovan gerek nûçegehanî bike û êşa gel biqêrîne û dengê xwe bigêjîne her derekê. Dema dujmin li me dixin, ew mafê me ye ku biqêrînin. Eger em usa nekin wê her roj zêdetir û bi cesaretek xorttir êriş dewam bikin.

Ya dûyemîn jî meseleya perwerde kirina gel. Em 30 xalên bingehîn a danezana mafê mirovana cîhanî didin gel heya ku wan bixwînin û bikarbin astek ji bo mesele ya mafê xwe nas bikin , heta ku dujmin bi rehetî êrişê wan neke û bikarbin li mafê xwe parastin bikin.

**_ Sedema ku tu ji bo wê hatî girtin çi bû?.**

* ez ne cara yekemîn e ku têm girtin û bawerim ku ew car jî ne cara dawî be. Ez gelek caran hatime girtin û bi gelek îşkenceyan jî rû bi rû mame. Mînakî sala 2000-2001 û sala 2004 bi taybetî min di wan salan de gelek zehmetî dîtin.di wan salan de ez bi tawana alîkarî û endametîya PKK hatim girtin û herweha gelek tawanên din jî didan ser min. min qet endametiya tu partiyek nepejirand. Min digot ku ez niwîskarekî serbixo me. Ez ji birêz Abdûllah OCELAN wek feylesufêk hez dikim û ew jî eger tawan be ez amademe ku cezaya wê tawanê bidim, lê ez ne girêdayê PKK me û hurmeta min ji bo gerîllayên wê partiyê û welatparêzên PKKyî jî heye. Ew bersiv dujimin dîn dikir. Min gelek caran bi hêzên ewlekarî diketim nawa munaqeşe û em li ser mesele ya Kurdistan , maf û herweha birêz Ocelan diaxifîn. Lê mexabin hêzên dewlet bi lêxistin û odeyên tarî û îşkenceyan bersiv didan.

Îcar tawana min dostanîya PJAK , alîkarîya endamekî RMMK bi nawê “Sirwe Kamkar “ û got û bêj bi televîzyonên kurdî bi taybetî ROJ TV bû. ⟶

www.arsivakurdi.org

Wek tê zanîn zivstana sala derbaz bûy endameke keç a saziya me bi nawê " Sirwe Kamkar " ji aliya hêzên dewletê di nawa bajara mehabadê bi armnca qetil kirna wî hat rewandin û cerdewanek bi nawê " Rehman é tevî hejmarek hêzên ewlekarî dixwastin wî bikujin. Lê dema ku me hejmara maşîna Rehman û nawê wî peyda kir û me bi lez şikayet kir, hêzên dewletê neçar man ku Sirwe serbest berdin. Pişt re dîmen û wêneyê bedena tijî îşkence ya Sirwe li ROJ TV hat belav kirin u hejmarek jinên mehabadê bi taybetî daykên aşitî ketin nawa mîtîngekî ku ew jî rastî êrişan hatin. Piştî çend hefte Sirwe Kamkar di nawa PKK de bicêh bû. Ew yek jî zêdetir dewletê tengezar kir. Piştgirîya min bi sirwe re bû sebeba acizbûna dewlet. Herweha hejmarek gotûbêjên min li ser henek meseleyên wek " Şiwane qadrî " û … bûne sebeb ku dewlet min bigre. Herweha endametiya min di nawa ajansa FİRATê jî bu sebeba ture buna dewlet û dewlet min bi nûçegehanî û şandina nûçe li dijî îran bo derweyê welat tawanbar dikir. Dema ku min girtin ez ketim nawa gireva birçîbûnê û di heman demê de gireva neaxfîn û bêdengî li hember hêzên dewletê. Ew yek jî bû sebeb ku ez li Mehabadê bibin zîndana tarî ya ewlekarî li Ûrmîye û li wê derê jî min gelek îşkence û zehmetî dîtin.

**Gelek rêxistinên mafên mirovan, saziyên kurdî û kurdistanî, nivîskar û rewşenbîran piştgiriya we di zindanê de kirin, pirsa me ewe gelo geşbûna vê xebata demokrat a aştiyane di cîhanê de, çi nîşan dide?**

* berê her tiştek ez gelek sipasîya wan kesan dikim ku piştgîrî ya min kirin. Bi taybetî radio u televîzyon û malperên kurdî, ajansa nûçeyan a Firat, rêxistina rojnamewanên bêsinur, PEN a Kurd û PEN a cîhanî û xelkê mehabadê… ez bi rastî xwe di wê demê de zêdetir berpirsyar dibînim ku layqê wan bibim û ez bawerim ku tenê bi zêdetir kirin û berfireh kirina kar û xebata xwe dikarim bersivek bidim piştgiriya wan. Ez bawerim ku me kurdan gerek ji bo pêşketina dêmokrasî û geheştin bi armncên xwe yên rewa di nawa xebatek berfireh di asta netewî û nawnetewî de bibin. Ji bo wê jî pêwîste ku di asta netewî de her kes xwe perwerde bike û em piştgîrî bidin hev û bi taybetî karê nûçegehanî û perwerde pêş bikewe. Eger em ji bo hevdû kar nekin, kes ji bo me naxebite. Gerek ez êş û elem û janê te bibînim û ji bo te hawar bikim û tu jî sibe ji bo min hawar bikî. A dûyem jî di asta nawnetewî de gerek em peywendî yên xwe bi saziyên nawnetewî yên serbixo yên mafê mirovan û saziyên dêmokratîk bihêz bikin û di asata ragehandinan de em dengê xwe bigêjînin cîhanê. Aniha di wê warê de kêmasî hene. Lê ez bawer im ku bi îradeyekî giştî û baş wê pêş bikewe.

**_Hun dixwazin li ser rûpelên NEWROZÊ çi ji xwendevanan re bibêjin?.**

* Ez tenê dikarim bêjim ku Newroz hêdî hêdî nêzî meye. Newroz pîroz dikim û baweriya me heye ku newroza serkeftinê jî nêziye. Silaw ji kawe yên hemdem. Silaw li welatê Newroz…silaw Newroz. Bi hêvîya ku em Newrozek bêsinur ( ku sinur hatbin rakirin ) li her 4 alîya welat bibînin…


**_ Em we sipas dikin, hêvîdar in her serkeftî bin.**

* serkeftin ji we re û ji hemî hêzên xebatkarên gel re

www.arsivakurdi.org

# Erefatê Brahîmê Ezem

## Yek ji kevintirîn xwendevanên kovara "HAWAR" ê Li Tirbespiyê dijî



Di kovara **RONAHÎ** ê de, hejmar 5- 1ê Tebaxa sala 1942an, Mîrê gewre **Celadet Bedirxan,** bendek bi navnîşana (**EREFAT kurê Brahîmê Ezem ji mala EMO REŞO an xwendevanê ber cot** ?) nivîsandiye, tê de, xîret û pesnê xortê nûhatî **Erefat** bi firehî aniye zimên, daxwaz ji mîr, beg û axayên kurda kiriye ku ew jî mîna **Erefat** guhdanê li zimanê dayika xwe yê şêrîn bikin.

**Hesen axa**, li ser hînkirina zimanê kurdî li **Cizîrê** weha ji **Mîr Celadet** re dibêje:(Wextekî min dersxaneyek vekiri bû û tê de dersa zarokan digot. Di nav wan zarokan de yek hebû, ji domanan, kurê **Brahîmê Ezem**, şagirtekî bi xîret û xebatkar bû, Carê ko ez diçim **Tirbespiyê**, **Erefat** hema ji min dipirse û dibêje: "Kanî **Hawar**, te ji me re **Hawar** anî?" û **Hawar** ji destê min digre û direve. Par, di wextê cot de ez dîsan çûbûm **Tirbespiyê** û di nav zeviyan de digeriyam. Çavê min bi cotkarekî ket. Ewî cotkarî tiştek bi destî ve hebû û ew tişt spî dikir. Bê hemtê xwe ez ber pê çûm. Ez çi bibînim **Erefat** e!, cotê xwe dike û **Hawarê** dixwîne. Min got-ê :"**Erefat** tu çi dikî". **Erefat** bêî ko serê xwe ji xwendinê rake gote min "Ma tu nabînî ez cotê xwe dikim û **Hawarê** dixwînim".).Vêca **Mîr Celadet** dibêje: "Kurdino! ji **Erefat** ibretê bigrin û bizanin ko mîr û axayên me yên ayendê yanî yên istiqbalê ew in, ew **Erefat** in ko kovara xwe li ber cot dixwînin û ne ew mîr û axa, beg û paşa.... yên ko xwe mezin dihesibînin, ji ber ko bi tenê û bi tenê mîr, axa, beg an paşa ne. Lê herçî ji nav wan weke **Erefat** kir, xwend û da xwendin û bi kêrî milet hat, mîrîtî an axatî ji wan re nabe bend ko ew jî li ber çavên milet qedirgiran bibin û li mezinahiya xwe a zikmakî mezinahîke rastîn, mezinahiya destexistî zêde bikin...".

* *Apê Erefat, berî her tiştî em hêvî û tika dikin ku Xwedê temenê we dirêj bike, tendurustiya we biparêze. Hêvîdar in hun ji me re pêşî li ser rewşa xwendina xwe ya wê demê bipeyivin, bi taybet li ser dersxaneya **Hesen Axa**, ew li kûderê bû, mamosteyê wê kî bû, xwendekarên wê dersxaneyê kî bûn, çi ji wê qonaxê tê bîra we?.*

- Ez **Erefat ê Brahîmê Ezem** im, li gundê **Dêr Emerê**, kurdistana bakur, sala 1917-an ji dayik bûme, dema fermana **Haco** rabû, ez biçûk bûm, bi bavê xwe re em daketin binxetê.

* *Ew dersxaneya **Hesen axa** li kû derê bû, mamosteyên wê kî bûn,* →

www.arsivakurdi.org

- Ew dersxaneya hun dibêjin, ya fêrkirina zimanê kurdî bû, **Hesenê Haco** ew li **Tirbespiyê** ji xortên kurdan re vekiribû, me tê de dixwend û dinivîsand, lê mixabin, piştî demekê, desthilata **Firensî** ew dersxane girt, lê, me di malên xwe de, berdewamiya xwendina xwe ya bi zimanê kurdî kir.

** Mamosteyên we kî bûn?*

- Yên ku têne bîra min, **Reşîdê kurd** û **Hesenê Haco** bûn.

** Navê kê ji wan hevalên ku bi we re dixwendin tê bîra we?.*

- Navê **Şemo** û **Osmanê Emînkê** tê bîra min. Hineke din jî hebûn, lê mixabin, navê wan nema tê bîra min.

** Gelo we **Mîr Celadet** dîtibû ta ku di kovara **Hawarê** de li ser we nivîsandiye?.*

-Piştî girtina dersxaneya me, min berdewamiya xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî dikir. Rojekê ji rojan, li rojhilatî **Tirbespiyê** min cotê xwe dikir, min dî trumpêlek di ber min re buhurî û nişka ve ew rawestiya, li min vegeriya, min dêt **Mîr Celadet**, **Hecî Ebdulkerîmê** Endîwerê û **Hesenê Haco** jê peya bûn û berê xwe dane min. Ji min pirsîn: Ev çiye di destê te de tu dixwînî?. Min li wan vegerand û got: Ev **Hawar** e, ez cotê xwe dikim û Hawara xwe dixwînim. Navê min li ba xwe nivîsandin, xwestin hin peran bidine min, lê min pere ji dest wan negirtin. Rê girtin û çûn. Piştî demekê, **Mîr Celadet** Eilifbêyeke kurdî û **Roja Nû** ji min re şandin, navê min li ser wan nivîsandî bû, piştî demeke din, dîsa pirtûkek ji min re û yek ji **Ebdurehmanê Eliyê Unis** û yek ji **Hesenê Haco** re rêkirin.

** Çawa işq û evîna zimanê kurdî kete dilê we, çima we ewqasî ji zimanê kurdî hez kir?*

- Dema em li kurdistana bakur bûn, hingî dewleta **Tirka** zor û stemkarî li me dikir, jiyana me roj bi roj reş û tal dibû, lewra me dizanî sedema vê zordariya li me dibe, kurdîtiya me ye, ji ber wilo jî, her û her kurdîtî û zimanê kurdî bi me şêrîntir dibû. Ji wan tirê bi darê zorê, wê karibin zimanê dayika me ji devê me derînin û zimanê xwe têxin devê me!!!..Yê me bi xwe, hêviya me ew bû ku em jî mîna hemî gelên cîhanê bi serbestî bi zimanê dayika xwe bixwînin û binivîsin.

** We di dersxaneyê de ji bilî **Hawarê** çi pirtûkên din dixwendin, ango çi li ber destên we hebûn?*

- Ji bilî **Hawarê**, me **Roja Nû** û **Xebat** dixwendin, nivîskarên wan **Qedrî Can, Osman Sebrî** û **Rewşen Bedrxan** bûn, camêrina din jî di wan de dinivîsandin, lê nema navê wan tê bîra min.

** Çi bîranên we yên wê demê hene hun dixwazin ji xwendevanên **Newrozê** re bibêjin?*

- Tê bîra min, Sala 1937-an palan zadê me bi das û qeynaxan diçinîn, min dît mirovekî dêwanî digel qîza xwe bi ser me ve hatin, xwestin ku ew jî bi me re paleyê bikin. Min dît palên me rawestiyan û gotin: " Eger ev mirov kar bike, em dev ji paleyê berdidin û diçine malên xwe, ji ber ku ev mirov neyarê me ye!!.Rabû min ji wan re got:" Malava ma ev çi gotin e?!! ma ne em hemî kurd in, em birayê hev in, fermana serê me yek e, neyarê gelê me yek e, **D.R(11)**

www.arsivakurdi.org

Dûv re , serokê P.Y.D.K.s mamoste Isma'îl Umer , gotina xwe pêşkêşkir. Di gotina xwe de , sedemên girtina sekretêrê P.Y.D.K.s û encamên girtinê diyarkir . Di vî warî de weha got : **Wan xwast, bi girtina hevalê Şêx tirsekê têxin dilên hevalên wî û namakê ji Tevgera Kurd û Niştimanî re bi rê bikin** . Lê bi girtinê negihiştin armancên xwe , ji dêvla wê herçû pileya xebata hevalan bilind bû û hêzên bira çi Kurd , Ereb û çi Aşûr piştgiriya xwe zêdekirin . Herweha mamoste Isma'îl domand û got : Girtina hevalê Şêx berhevhatina T.K û T. N zêdekir . Û got : **Ciyê gelê Kurd ne hepis û zîndan in , ew hêjayî jiyaneke xweş û geş bijîn , û tucarî pirsa gelê Kurd bi hepis û zîndan û girtinê çareser nabe** . Piştre gotina mamoste **Mustefa Cuma** sekretêrê Partiya Azadî ya Kurd Li Sûriyê hat . Di gotina xwe de birêz Cuma da xuyan ku , **pirsa gelê Kurd li Sûriyê pirsa milet û axê ye** , pêwîste jaliyê Tevgera Kurd ve , li ser bingeheke rast û durist were zelalkirin û mijayî nemîne . Li dawiyê sekretêrê P.Y.D.K.s mamoste Şêx Alî gotina xwe weha pêşkêş kir : **Silav û sipasî ji hemî piştgirên Tevgera Kurdî û niştimanî de bigir û ta hemî kes û komeleyên mafên mirovan û yên sêvîl , bi taybetî jî ( Imnistî** ) . Paşê jî silav ji **nemirên xebat û peyva azad mîna Dr.Nûredîn Zaza , Osman Sebrî , Hemzê Niwêran , Kenan Egît , Yusof Elezme , Ehmed Baravî , Ibrahîm Henano , Ebdirehman Osman , Ebdilhemîd Zîbarî û Ebdî Ne'san** , û H.W.D re rêkirin . Di nav re , li ser hebûna gelê Kurd ya dîrokî û erdnigarî sekinî û xuyakir ku Kurd ne koçber in Û. got em Kurd di vî welatî de hevpişkin



, Lidawiyê, gotina xwe bi, azadî , wekhevî , aştî û çaresekirina pirsa Kurd , na ji şovenîzmê re , na ji zulim û zorê re qedand . Weha jî vastîval bi dawî bû.

Di bin konê xêrhatin û azadiyê de, hevalê Şêx bi awakî fermî pêşwaziya şandên xêrhatinê ji aliyê hevalên P-Y ji hemî herêman, partiyên dî çi Kurd, Ereb , komonîst , mal û malbetên Kurd û cîran û dostên xwe yên Ereb dikir .

Hertim wî digote tevan, em ne poşmam in , em ji riya xwe namînin , gelê Kurd li Sûriyê ji paş tu sînoran nehatiye , ew xwedî xak û erd û ziman e , pirsa me pirseke rêzanî ye û li Sûriyê wê çareser bibe , Divê zimanê me neyê pişaftin , zimanê Kurdî ji yê Erebî , Farisî û Turkî ne kêmtir e , Sûriyê bi xêr be em bi xêr in û di vî welatî de mafên me rewan e . Ji ber wê divê dûr û nêzîk zanibin em Kurd pişikdar in jî. .

-weyî bi xêr vegerî nav me û gelê xwe hevalê Şêx Alî .

- Bijî gelê Kurd .

**Memê Alan**

www.arsivakurd.org

# Ûsivê Hersan
# Nivêsakarê HAWAR ê yê dawî ye

**Husên Ehmed**

**Werger ji zimanê Erebî: NEWROZ**



**Amûda bavê Mihemed**, Amûda ku bi agirê zikreş û kîndaran di dîroka xwe ya nûjen de bêtirî carekê hatiye sot û wêrankirin, rojekê ji rojan, serê xwe ji dijminên rastiyê re ne tewnadiye, sitem û zordestî ne pejirandiye, her û her wê li ber xwe daye, herdem, beşdarî di xebata netewî, wêjeyî, çand û zimanê kurdî de kiriye.

Amûdê, vî bajarokê bi gewd û qilafetê xwe biçûk, lê bi dan dahênanên xwe mezin. Amûda çavreş, gelek lehengên netewî afirandine ku, di warê xebata netewî de bûne stêrkine geş û bi ronak, bûne mûm û find, xwe şewitandine û riya gelê xwe ronî kirine. Yek ji wan lehengan, ÛSIVÊ HECÎ HERSAN e, yê ku 71 salî di ber doza gelê xwe ya dadmend û rewa de, kar û xebateke bê westan kiriye.

Li gundê **Sêmitika Newaf**, yê nêzîkî Amûdê, sala 1918-an ji dê û bavekî kurd ew ji dayik bûye. Dê û bavê wî, hêj berî danîna sînorên Sûriyê ji gundê **Darê** hatibûn gundê **Sêmitik**.

Ji biçûkaniya xwe ve, Ûsivê Hersan, bi derd û êşekên gelê xwe hest bû, bi lez û bez, barê kurdewariyê hildigre ser milên xwe û dest bi têkoşênê dike. Di rêxistina **Xoybûnê** de ya ku di 28/11/1927-an de hatibû damezirandin û Dr **Ehmed Nafiz** birayê Dr.**Nûredîn Zaza** rêvebirya şaxê Cizîrê dikir, dibe endamekî zîrek, milê xwe dide milên xebatkarên kurd ên navdar mîna **Osman Sebrî**, (**Qedrî beg**, **Ekrem beg**) lawên **Cemîl Paşa** yê Diyarbekirî, **Hesenê Dêrikî**, **Reşîdê kurd**, **Cegerxwîn**, **Seydayê Tîrêj**...û hwd, dest bi karê rêzanî dike.

Sala 1935-an, li rex xebata xwe ya rêzanî, **Ûsivê Hersan** dest bi xebata çandî jî dike, gelek berhem û gotaran di kovara **Hawar** û **Ronahî** de ewên ku **Mîr Celadet Bedirxan** sala 1932-an li Şamê çap dikirin, weşandine.

Di gotara xwe ya bi navnîşana " Gelo Izrayîl dijminê kurda ye?" li ser derd û tewanbariya li gelê kurd seranserî Kurdistanê dibû nivîsandiye. Herweha, wî bi navê xwe yê eşkere gelek gotarên rêzanî di kovara **Stêr** û **Roja Nû** de, yên **Mîr Kamîran Bedirxan** li **Bîrûtê** çap dikirin nivêsandine.

**Ûsivê Hersan**, li gel nivîskar û rêzanên kurdan yên mîna **Mele Hesenê Hişyar, Qedrî Cemîl Paşa, Ebdurehmanê Eliyê Ûnis, Ekremê Cemîl Paşa, Dr.Ehmed Nafiz, Arif Abas beg**, helbestvanê navdar yê ku " **Agirê Sînema Amûdê**" sala 1962-an nivîsandiye(**Mele Ehmedê Namî**), **Cegerxwîn, Reşîdê kurd û Osman Sebrî**...û hwd, ta sala 1940 î, xebata wêjeyî berdewam kiriye.

Piştî ku parta demokrat a Kurdistan li Sûriyê sala 1957-an di bin bandora

**D.R ( 10)**

www.arsivakurdi.org

# Wan Bêdadegeh Dihêlin

**Dîlan Ziving,**

**Di** wa şevê de, xew nediket çavên min ! Hest û ramanên bivetî û tirsê ,xwe li min pêça bûn ku , bûyerek an jî … wê were serê bavê min , yê bi awakî ji me bi dûr keve , nemaze pêlên xemgîniyê ji çend rojan ve li ser rûyê wî baş diyar bûn . Lê zor mixabin , zarokekî mîna min biçûk , pênc mihekî ne dîl ne ziman da , ji min hilînin ku bûyereke nediyar , li van rojan , biser me de tê . Gelo , cima ew nikarin ji yên weke me rakin ? . Vêca jî , tenê min dikire qîr û girî, ji girî pê ve min nedikarî tuştek bikira . Hêvî û armanca min, ji ev reng girînê, ew bû ku , belikîm ew dê û bavên min yeka xwe ji min hilînin ? Pir û pir mixabin, wan bi xemgînî û şêtmayî li hevdu dixurcilîn û weha digotin : Bi xwedê ev zarok nesax e ! Pêwîste, em wî bibne ser bijîşkekî.. û her wisan jî, wan xwe ji bo wê ,xwe amide dikir. Hingê bavê min , bi dilovaniyeke bê hempa ez hembêz dikirim , bi rûkî berkenî strana kalo yak u , min pir jê hezdikim û pê kêfxweş dibûn , wî ji min re distire. bêdeng li çavên wî dimeyizand û dixwest jê re bigota : bavo! xoşewîstê dilê min , ez ne birçîme û ne jî nesaxim lê,li ser te bi tirsim ku , bêbexitya demê, destên me ji hevdu bike ! di wa destnavê de deng bi diya min diket û digot : ji bo çûna texitor em amide . Wa hinge, bavê min bersiva diya min weha dida û digot : vaye zarok hêdî û bêdeng bûye , sibe bê û xêr pêre , şev derang e û texitor …. Min careke dî dest bi girî û hawara xwe dikir, bi vê awî diwestiyam pîçikê xilmaş û bê hêz dibûm pêre ..pêre jî şifaqa sibê li me vedihat û min careke dî girî-şîn dikir. Wisan jî , wan bi lez ez dibirme texitor û li vegerê bavê min xatir ji me dixwet ku , ewê biçe ser karê xwe, wa hingê min bi hêrs dikire qîr û girî .Lewre jî, weke mirovekî sermest radiketim . Piştî çend katan, min çavên xwe vedikirin ku , ez li mala pîrika xwe raketîme û hemû xemgîn û melûl in. Diya min, bi serbilindî weha digot : ew ji bo rûmeta gelê kurd îro , ji me bi dûr ketiye . Lê min baş dizanî ku , diya min li ser çarenûsa bavo çiqas bi qisawet û melûl e herdem hêvî û armanca wê , ji wa roja xemgînê ve ku, min dixewêke û bi dost û hevlên bavo re, li ser rewşa wî baxife. .. Ez qet ranediketim û pêre ..pêre guftogoyên wan tevan dikir ku kesatiya bavo baş nasbikim .. Ew mirovekî birêz û xebatkar e, yekek ji serok û rêberên tevgera kurd e . Loman jî , îro neyar ji yên weke wî ditirsin û wan digrin, di binê hepis û zîndanên rêjîma sûriyê ya şoven û bêbexit de bê dadegeh wan dihêlin.

***Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re yên di girtîgehên Sûriyê de***

www.arsivakurd.org